



HEQÊ MIN HEYE  
KU EZ BI DILÊ XWE  
BIZEWICIM



**Kurmandji**

# TU JI DI VÊ REWŞÊ DA YÎ?

## TU DITIRSI KU TU ...

... dê nîkarîbî bî dilê xwe bîzewîcî?

... dê nîkarîbî jî yekê/yeka ku hevcînsê te ye hez bîkî?

... eger zewîcandîy, nîkarîbî jî jîna xwe/mêrê xwe veqetî?

Dî vê broşurê da tu dîbînî ku, eger tu bîxwazî bî kesek ra bîpeyîvî, tu dê jî ku alîkarî bîxwazî.

*"... Mîn xwe du alî pêjn dîkîr.*

*Alîyekî mîn Meryema zewîcandî bû ku dê  
lî gora daxwazên malbatê mal daniya,  
alîyekî mîn ê di jî keçeka cîwan a şagîrda lisê bû  
ku, heta bêjî bêriya hevalên xwe yên dibistanê  
û hevalê xwe yê lawîn ê lî welêt, lî Swêdê, dîkîr."*

(Keçeka cîwan)

## TIŞTÊN KU LI SWÊDÊ DERBAS DIBIN ÇI NE?

- Mafê te heye ku tu biryar bîdi ku tu dê bî ki ra bîzewîci.
- Kesên ku dê bî hev ra bîzewîcin divê dî dawetê da bîn û bî daxwaza xwe jî hev ra bêjin "belê".
- Divê tu bî kemasi 18 salî bî jîbo ku tu karîbî bîzewîci.
- Bî destûreka taybetî ya jî ber hîn sebebên taybetî, tu jî 18 salan biçûktir bî jî tu dîkari bîzewîci.
- Bê qanûnî ye ku kesek, bî rîya şîddetê yan jî bî tehdîta şîddetê, bî zorê, bê dilê xwe bê zewîcandî.
- Eger tu zewîcandî yî mafê te heye ku tu veqetî.

(Gora qanûna Swedê)

*"... Dê û bavê min jî nuha ve biryar dane ku ez dê bî ki ra bîzewîcim... Gelo mafê min tune ku ez bî xwe biryar bîdîm ku ez dê bî ki ra bîzewîcim??? Jî kerema xwe ra alîkariya min bikin ..."*

(Keçeka cîwan, 15 salî)

# LI VÊ DERÊ ALİKARI HEYE

Dı despêkê da tu dikari bî mezînek ra bipeyîvi  
Yekê / yeka ku tu nas diki û pê bawer i.

## Dibistan

Lı dibistanê, bî kesên wek ma-mosta, şêwirdar (kurator) yan ji hemşîre ra pêwendî dayne.

## Muayenexana jibo cıwanan (Ungdomsmottagningen)

Dı muayenexaneyeka jibo cıwanan da cıwanên navber 13 û 25 salî lı ser gelek pirsên jı hev cuda alikari dibînin. Dı siteya "umo.se" da tu dikari, bê ku bêjî tu ki yî, pırsek bırsî û bersiveka şexsî bîstîni. Tu dikari adresa muayenexaneyeka cıwanan a ku jı te ra nêzik e jı peyda bîki.

[www.umo.se](http://www.umo.se) ■

## Xeta telefonê ya jibo huzûra jinan (Kvinnofridslinjen)

Her kes dikare telefonê "Kvinnofridslinjen" bîke û alikari û tewsiye bigire. Tercumanên wan ên ku bî zımanên di jı û bî swêdi jı zanın hene. Peyvîna bî wan ra belaş e û dı fatura telefonê da xuya nake. Her tım kesek bersiva telefonê dide.

[www.kvinnofridslinjen.se](http://www.kvinnofridslinjen.se) ■

tfn: 020-50 50 50

## Acilxaneya jibo keçan (Tjejjouren)

Dı acilxaneyeka jibo keçan da hın keç dı wextê xwe yê vala da kar dîkın, alikariya keçên cıwan dîkın û wan serwext dîkın. Eger divê tu herî sosyalê yan jı herî polês, keçên ku lı acilxanê kar dîkın dıkarın bî te ra bên. Dı siteya "tjejjouren.se" da tu dikari meyl bîşeynî, bî kesên di ra bî riya "chatt"ê bipeyîvi yan jı acilxaneyeka ku jı te ra nêzik e bîbîni.

[www.tjejjouren.se](http://www.tjejjouren.se) ■

## Siteya jibo pirsên derheq mêran da (killfrågor.se)

Dı vê siteyê da tu dikari meyl bîşeynî û bî kesên ku dı vê babetê da xwenda ne ra bî riya "chatt"ê bipeyîvi.

[www.killfrågor.se](http://www.killfrågor.se) ■



### Siteya jibo pirsên namûsê (heder.nu)

Eger tu homoseksuel i, biseksuel i yan ji transkes "transperson" i tu dikari alikari, destek û enformasyon ji siteya "heder.nu" bigiri. Du dikari meyl bişeyni yan ji belaş telefon biki.

**www.heder.nu**  
**tfn: 0200-160 160**

### Siteya jibo pirsên mafên te (Dina rättigheter)

Dî vê siteyê da tu dikari bixwini ku mafên te çi ne, tu dikari meyl bişeyni û bi riya "chatt"ê bi kesên di ra bipeyivi.

**www.dinarattigheter.se**

### Polês

Eger tu bêy tehdit kîrîn, tu girti bêy hiştin yan ji tu bêy lêdan, ji numra 112 telefon bike.

**www.polisen.se/komtilloss.se**  
**tfn: 112**

**tfn ji derê welêt:**  
**+46 771 14 14 00**

### Xizmetên sosyal (Socialtjänsten)

Xizmetên sosyal jî aliyê belediyê ve tîn dayîn û hemî kesên ku li Swêdê dijîn wextê pêwîst be dikarin alikari bigirin. Adres û numra telefonê di siteya belediya te da heye. Dî wê siteyê da numra acîla sosyalê jî heye û tu dikari êvaran, bi şev yan ji di tehtilan da jî wê numrê telefon biki.

**www.skl.se/web/kommuner**

### PIRRTIR ENFORMASYON

Dî vê siteyê da tu dikari pirtir tişt bixwini, mesela tu kari çî alikari ji sosyalê bistini.

**www.umo.se**



Lî vîr tu ne mecbûr i bêji tu ki yî, eger tu naxwazi bêji, mebêje

# TU DÊ HERÎ DERÊ WELÊT? – bîfîkîre ku!

Hîn keç û kur wextê bî malbatên xwe ra dîçîn derê welêt, bî zorê tîn zewicandin. Eger tu dîtîrsî ku tu dê bêy zewicandin, dî ber xwe da bîde ku tu lî malê bîsekîni.

Berî rêwîtiyê tu dîkari bî mezînek ra, ku tu pê bawer î, yan jî bî yek jî xebatkarên sosyalê ra yan jî bî polês ra bîpeyîvî. Ew dîkarî hewl bîdî ku alîkariya te bîkî jîbo ku tu neçî.

Lê eger tu illa mecbûr bî bîçî û lî wir jî te ra problem derkevî, tu dîkari lî wî welatê ku tu tê da yî, bî sefaretxana Swêdê ra pêwendî dayî. Dî pîraniya welatan da sefaretxaneyeka yan jî konsolosxaneyeka Swêdê heye ku alîkariya Swêdîyên lî derê welêt dîke.

Lê wextê tu ne lî Swêdê bî, dîbe ku jî polês ra, jî sosyalê ra û jî sefaretxana Swêdê ra zehmet be ku alîkariya te bîkî jî ber ku lî welatên dî qanûnên dî derbas dîbî.

## PIRRTIR ENFORMASYON

Dî vê siteyê da tu dîkari adresên sefaretxaneyên Swêdê bîbîni û alîkariyên ku tu dê karîbî bîgîrî bîxwîni. [www.regeringen.se](http://www.regeringen.se) (Sefaretxane "Ambassader", konsolosxane "konsulat" û tewsiyên rêwîtiyê "reseråd" bîtkîne)



# LISTEYA QONTROLÊ



Telefona destan (mobil) û qerta "sim" a telefona destan (simkort) zêde bî xwe ra bibe!

## Pêwendî dayne/Kontakt dayne

- kesek ku ez pê bawer im
- xebatkarên sosyâlê
- polês.

## Tîştên ku jî wi/wê ra bêjim

- ez dê kengi vegerim (tarix)
- eger ez di wê tarixê da venegeriyabim, ew kes bila bî belediyê ra pêwendî dayne
- eger ez di wê tarixê da venegeriyabim, ew kes bila bî sefaretxana Swêdê ya li welatê ku ez tê da me ra pêwendî dayne.

## Tîştên ku bîdîm wi/wê

- kopyayeka pasaporta xwe
- numra telefona xwe
- adresa meyla xwe.

## Numrên telefonên û meylên ku divê ez jî bir nekim

- kesê / kesa ku ez pê ra peyivim
- ehl û hevalên ku dîkarin alikariya min bikin
- sefaretxana Swêdê.



# Ungdomsstyrelsen

Karbidestiya jibo pirsên ciwanan meqamek e ku li ser şertên jiyânê yên ciwanan xwediye zaninê ye. Em destek didin xebata komeleyan û belediyan û hevkarîya navberneteweyî.

Ev broşur ji siteya

**[www.ungdomsstyrelsen.se/olikasprak](http://www.ungdomsstyrelsen.se/olikasprak)** tê girtin yan tê xwestin



**UNGDOMSSTYRELSEN**  
[www.ungdomsstyrelsen.se](http://www.ungdomsstyrelsen.se)